



Tevî 5salan ji şer, hîn
çandnî li rojavayê
KUDISTANê li ber
xwe dide.



PEYVA WELAT

Nifşên nû bi kurdî baştir dizane.

Aras Yûsiv

Dibe hîn zehmet be ku em bêjin ku bîranînên girêdayî qedexkirina li ser çanda kurdî ji hişê mirovên kurd li rojavayê kurdistanê derketiye, hîn gelek çîrok hene tene gotin û hin in din jî hîn dê nifşên bê li ser baxifin û bêjin ku berî çend salan dayik û bavên me ji me re gotin ku çanda kurdî bi tevahî rastî bînpêkirin, çewisandin û mirinê dihat.

2 Li gundê Topo yê girêdayî bajarê Amûdê, çîrokek ji van çîrokên çewisandinê derbas bûbû, li wî gundî û li gora ji min re hate gotin ji ber ez tenê havînan diçûm wir, hate gotin ku komêk ji zîlamên kurd biryar dabûn ku xwe fêrî zîmanê kurdî bikin, nemaze kesek li gund peyda bûbû ku wî bi kurdî dizanîbû û gelek ji helbestên Melayî Cezîrî û Cegerxwîn ezber kiribûn, lewra her şev komêk zîlam dihatin ba hev û wî kesî zane bi kurdî ew zîlam fêrî kurdî dikrin.

Helbet ev fêrkirin ne eşkere bû, lê ji ber bûyereke wisa nû û balkêş, zehmete ku tenê di nav çend kesan de bimîne, hêdî hêdî ew çîrok belav bû ta ku giha hinek ji ajan û muxburên rêjîmê li gund.

Piştî çend waneyên zîmanê kurdî, çend tirimbêl êvarî debasî gund bûn, ew tirimbêl in ku gelek bîranên tirsê di hişê xelkê de hiştibûn, tirimbêlên spî û mersîdis û cêb in ku şaxên ewlekariyê yên rêjîmê ew bi kar tanîn, ji xwe ji ewlekariya rêjîmê re hatibû gotin ku ev waneyên zîmanê kurdî li kîjan malê tene dayîn.

Ji ber ku wext teng bû û tirimbêlan bi ser malê de girtin û derfet nema ku zîlamên beşdarî kursê zîmanê kurdî bûne defter û pelên xwe veşêrin, mamoştê û zîlamên kaxez ji defterê xwe jê kirin û kirin qet, lê piştî ku pê hesiyar ku mumkîne ewlekariya rêjîmê li koma gelek a

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Deşteya rêvebir:
Mihemed Zekî Mihemed

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

pelên qetiyayî binere û wan bide hev û nas bike ku ew dersên zîmanê kurdî dibin, wan zîlamên qetê kaxezan xwarin û daqurtandin.

Ji sedî sed li gelek malan çîrokek wek vê yan nêzkî wî heye ku zîman û çanda kurdî di riya fêrkirina wê de, rastî çî û ne çî hatiye, li hin malan pirtûkên zîmanê kurdî di kadîne yan di nav beroş û nivînan de dihatin veşartin, û ta ku tîpek ji zîmanê kurdî hatibe fêrkirin komêk tirs hebû ku zîlamên rêjîmê bi ser wan de bigirin û bêjin ku ew dixwazin welat parçe bikin an ji nîrxê netewî kêmkirin an gunehekî din ji van ku bi hesanî rêjîmê ji ber wê seza li ser gelek ji rewşenbîran birî û ew zindan kirin.

Îro tişteki gelekî balkêş di nav xelkên rojavayê kurdistanê de derbas dibe û ew ku zarok û nifşê biçûk ji vî miletî bi zîmanê xwe zane bêtir ji nifşê mezinan ji ber ew di dibistanan de waneyên zîmanê kurdî dibin.

Ev nifşê biçûk dê mezin bibe..û ew ê li paş xwe binere û bêje: Bi hezarê salan bav û kalên me ev zîman bê pirtûk û fêrkirin ji me re parastîne û roj hatiye ku em wî biparêz in. ■

تَبَنِّي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

Çima Çîrokên Helbestî

kemal Elsîno

Dewlementirîn Kelepûra cîhanê, kelepûra Kurdî ye, lê mixabin pirê vê Kelepûrê devkî ye.

Tevî Ku xebat jê re hatiye Kirin, lê ew xebat ne Fireh bû û ne bi rengekê zaniştî bû, Sedema vê yekê jî ji ber Ku Kurdistan dibin destê dagîrkeran deye, ji lewra her wêjevanekî li gorî Ku Karî bû bi Comerdî ji Kelepûrê re Kar û xebat Kir û weha jî hemû sazî û partiyên Kurdî .

Çîrok nifşek ji kelepûrê, lê nifşekî Ku bi hêvî û xewnên zarokan û mezinan ve pir girêdayî ye her zarok di xwaze êvaran li Çîrokan guhdarî bike weha jî mezin di civata de li Kêleka Stiranê carinan li çîrokan guhdarî dikin.

Ez bi xwe ji Zaroktiya xwe de min pir li stiran û çîrokan guhdarî dikir û Piştî sala 1992 an Piştî min xwe fêrî Zimanê Kurdî Kir min xwest Ku ez jî divî warî de xebatê bikim, ji lewra min jî dest bi nivîsandina Çîrokên Folkloî Kir û min hijmarek hindik ku bêtirî (80) ê Çîrokî dane ser hev.

Ez ramiyam ezê bi çî şeweyî çîrokan binivîsînim sê ramanên sereke Ketin serêmin

1- Ez çîrokê weke Ku min bihîştîye

binivîsînim.

2- Ez çîrokê bi şeweya nûjen binivîsînim.

3- Ez çîroka bi helbestî binivîsînim.

min şeweya sisyan hilbijart . belkî Ku hinek bipirsîn : çima çîroka Folkloî te Kirye çîroka helbestî ? ez dibêjim: çîroka Folkloî berî her yekê li her deverê birengî tê gotin û bilkî ev çîrok jî hatibin nivîsandin û çapkirin . Lê bê guman ne bivîrengî . wehî mîrê helbesta Kurdî Ehmedê xanî çîroka Mem û zîn bi helbestî kir daştane, heger yek bibêje: Mem û zîn çîroka jiyanekê bû, lê ev çîrok tenê bi Bûyereke ve girêdayî ye, Ez dibêjim Ehmedê xanî çîrok kir daştane û emê çîrokê bikin helbestek

sedema ku min çîrok kir çîroka helbestî ji ber ku :

1- Helbest bi heştê mirov ve pirtir girêdayî ye.

2- Zû ezberkirin di çîroka helbestî de heye.

3- Zarok û mezin dikarin bi lîsk û karê xwe re bêjin wek sitiranê.

Ji bîngehê ku min çîrok li ser danîne ez li ber navê Mirov û devera de neseqînî me ev jî ji ber ku

1- Her deverê çîrokê bi navê herê ma xwe ve girêdide.

2- Hin caran nav û dever dibin sedemê aloziyan, ya giring ewe ku em li cem bûyerê bisekinin û sûdê jê bigrin.

Ez hêvî dikim ku ev karê min têkeve xizmeta wêjeya Kurdî û razibûna YEZDAN her ew daxwaza min e. ■



Hevpeyvînek bi nivîskar û romannivîsê Kurd Elî Kolo re

Hisên Elsîno



4

1-Em bixêr hatina te dikin,destpêkê xwe bi xwênerên kovara welat bidî nasskirin?

Elî Ebdullah Kolo,Ji gundê Ebû ceradê nêzîkî dirbêsiyê,zayîna min sala 1980 ye,xwendina xwe ya seratayî li gund derbas kir,pişt re li dirbêsiyê û Amûdê xwendina xwe qedand û li zankoya şamê (beşê parêzeriyê) min xwendina xwe bi dawî kir.

2- Tu dikarî li ser kurte jiyana xwe ya wêjeyî baxivî û,çi pirtûkê te pêşkêş kirina?

- Min Sala 2014 an pirtûka (pendên kurdî) çap kir û helbest û gotaran bi zimanê kurdî û erebî jî dinivîsim û di malperan de hatine belavkirin.

3- Pirtûka te ya dawî,romana (Elsecîn السجين) e, tu dikarî naveroka wê ji xwêneran re diyar bikî?

- Romana (El secîn السجين) romaneke evînî û rêzanî ye û di naveroka wê de asteng û îşkenceyên miletê sûrya û bi taybet yên miletê Kurd hene di dawiya sed Salan bîştan de.

4- Çima romana te ya (El secîn السجين) li Dirbêsiyê û her wiha li herêmê bi giştî ne hate belevkirin?

- Min hin hejmar ji romanê şandin dirbêsiyê û Qamişlo ku wek xelat bêne belavKirin û bi hêvî me ku li Rojavayî Kurdiştan bi tevayî belav bibe.

5- Di siya şoreşa sûryê de gelek Yekîtiyên nivîskaran hatin damezrandin,tu çawa vê rewşê dinirxînî,gelo tu di nav wan deyî?

- Çawa partiyên me belavkirîne,nivîskar jî belavkirîne û ev pirsgrêka kurdan e,ez endamê hevgirtina nivîskar û rojnemavanên Kurd li sûryê me,min û hevalekî xwe hewilda da ku hevgirtin ne be dido,lê ne wekhevî Ji hewildana me mestir bû.

6- Gelek radyo û kovarên serbexwe li bajarên kurdî hene,win paşeroja wan çawa dinirxînî?

- Gava tirs namîne,partî,rêxistin,êzgeh,kovar û pir tiştên din pir dibin,lê dawiyê yê ku tiştên qenc û bi sûde pêşkêş dike,ew dimîne.

7- Gotina dawî ji kovara welat re?

- kovara welat bi navê xwe pir mezin e,Ji ber ku navê xwe kiriye welat ez bi gumanim ku her welatî wê xwe tede bibîne,Serkeftin û berdewamiyê Ji kovara Welat re dixwazim.



Komara Mihabad di dîroka Kurdî de


Izedîn Salih

Bi dawîbûna Cenga Cîhanî ya dûyem re û serkeftina hêzên hevpeyman, ew hêz derbasî Îranê bûn û şahê wê «Riza Pehlewî» dûrxistin ji ber ku ew bi «Hêtlar» re hevkar bû, di encamê de Îran kirin du perçe, Bakûr û Rojavayê Îranê girêdayî hêzên Soviyêtî, û Başûr û Rojhilatê Îranê girêdayî hêzên Bîrîtanî.. vê yekê hişt ku Gelên Îranê yên ne Farisî wek «Kurd û Ezerî» hewlbidin ji van guhertinên ku çêdibin haviliyê bikin û derfetê ji dest xwe nebin çimkî desthilata şah zordarî û sitemkarî li wan dikir û mafê wan tune dikir.

Gelê Ezerî di demek kin de keyes bir û Komara «Ezerebîcan ya Demokrat» li Tebrîzê ragihand.

Herwiha di 22 ê Çileyê sala 1946an de Serokê Partiya Demokrata Kurdistan ya Îranê pêşewe «Qazî Mihemed» li Gasîna «Çar Çira» li Mihabadê li hemberî zêdetir ji 20 hizar kurdan û hinek rayedarên Kurd Komara «Kurdistan ya Demokrat» ragihand bi alîkariya Berzanî »Mele Mustefa» yê ku bû Fermandarê Artêşa wê, Hikûmeta komarê ji 13 serokwezîran pêk dihat û Zimanê Kurdî yê bi tîpên Soranî tê nivîsandin ew zimanê wê yê fermî bû, herwiha gelek gav di aliyên çandî, leşkerî û rojnamevanî de jî hatin avêtin, û rola Jina Kurd jî di civakê de hate pêşxistin, û kêmnetewên olî û milî «Aşûrî Ermenî, Yehûdî, Ezerî» di Komarê de azad bûn û mafên wan tomarkirî bû.

Rêberên herdû Komarên Kurdistan û Ezerbîcan di sala 1946an de rêkeftina hevkarîyê bi hev re imze kirin, lê Ezerî xwedî lê nederketin û zû ji Tebrîzê ber bi Yekîtiya Sovyêtê ve reviyar piştî ku Yekîtiya Sovyêtê hêza xwe ji Îranê kişand û piştî Kurd û Ezerîyan berda, bi vî rengî zêdetir ji 20 hizar kesî li Tebrîz û herêmên din yên deshilatdariya Komara Ezerbîcanê hatin kuştin û Ezerbîcan kete bin destê şahê Îranê »Mihemed Riza Pehlewî», ev yek bû sedem ku Komara Kurdistanê bi tenê bimîne, bûyer bi awayekî tund li pey hev derbas bûn, û pêşewe Qazî Mihemed xwest rê li pêşiya wêrankirina bajarê Mihabadê bigire, lewma wî zû ji serleşkerê artêşa Îranê û desthilatdarên Tehranê re nameyek şand û tê de got: «Ger hûn bixwazin bi vî rengî êrîşê bînin ser Bajarê Mihabadê, emê ta dilopa xwîna xwe ya dawiyê li dijî we şer û berxwedanê bikin», û piştî di mizgefta «Ebas Axa» de Gel û birêveberên Komara Kurdistan li hev civandin û ji wan xwest ku di derbarê şer an teslîmkirina bajarê Mihabadê de nerînen xwe bînin zimên û wî di wê rojê de ji Gel re da diyarkirin ku: « Ez di xweşî û nexweşîyan



de bi we re bûm, û ezê xwe bidim destê karbidestên Dewleta Îranê da ku bi kuştina min hemû kîn û kerba xwe ser min vala bikin û bila ziyanek negihêje we, ez bi sûnd, peyman û girêdana bi Gelê xwe re wefadar mame û qet ji we dûr nakevim, ez berpirsyartiya her tiştî dixim stûyê xwe, bila baweriya we ta dawiyê bi min hebe ...».

Komara Mihabad bi tenê 11 mehan dirêj kir û di 18 Berçile de ji wê salê hat hilweşandin û pêşew Qazî Mihemed jî li Gasîna «Çar Çira» ya ku Komara xwe tê de ragihand bi destê leşkerên Îranê û bi ferman ji şahê wê hat bidarvekirin piştî ku xwe radeştî Karbidestên Îranê kir da ku Gelê xwe biparêze, çimkî ew sembûla fîdakarî û lehengiyê bû, wiha wî navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka Kurdan de xêz kir. ■

صفات التبول: - تواتر البيلات النهاري.

- الإلحاحية نهاريًا.

- رشق البول ضعيف أو متقطع.

- قصة اضطراب تمايز جنسي.

- موقف العائلة وتعاطيهم مع سلس البول.

- فحص سريري عام. البطن (جس كتل برازية - تحري توسع المثانة).

الأعضاء التناسلية الظاهرة: المظهر- وجود سحجات أو طفح - حالب هاجر- تمايز جنسي.

عصبياً: - آفات تخاعة. - الحركة والمشى. - مقوية وإحساس الشرج.

التشخيص: - تحليل التبول: - الكثافة النوعية للبول. تحري السكر والبروتين.

- الفحص المجهرى لتحري الإنتان (زرع بول وتحس دوائي).

- مفكرة التبول: - وقت كل تبول. - مقدار كل تبول. - إيكو جهاز بولي. -VCUG (تصوير مثانة ظليل أثناء البول).

- الدراسة البيوروديناميكية.

- المعالجة: المعالجة مستقلة لكل طفل و عائلته وبيئة المجتمع:

أ- طمأنة الطفل والأهل: شرح الحالة للطفل ولوالديه يساعد في حل المشكلة حيث يحدث الشفاء العفوي عند ١٥% سنوياً.

ب- التحفيز: يجب أن يتم التعزيز الإيجابي بوضع لصاقات أو نجوم على دفتر الطفل ومكافأة الطفل عند تحقيق إنجاز حتى و لو كان هذا الانجاز ليالي جافة قليلة في البداية وعدم التوبيخ وتعزيز الثقة.

- تحديد كمية السوائل التي يشربها

والطفل قبل الذهاب للنوم بساعات وخاصة الشاي، القهوة، الكولا، الشوكولا.

- إفراغ المثانة قبل الذهاب للنوم.

- إيقاظ الطفل للذهاب للحمام خلال الليل.

هذه المعالجة تحدث تحسناً عند ٧٠% من الحالات.

المعالجة الدوائية: هذه المعالجة يجب أن

تكون تحت إشراف الطبيب بسبب اختلاف

الحالة عند كل طفل ونتيجة التأثيرات

الجانبية لهذه الأدوية. ■



سلس البول الليلي (بول الفراش) Nocturnal Enuresis

د . فهد محمود الحسين

التعريف

: هو استمرار تبليل الفراش أثناء النوم بعد العمر المتوقع للسيطرة على التبول، ويختلف هذا العمر باختلاف المجتمعات.

بول الفراش يمكن أن يحدث ليلاً ونهاراً أو ليلاً فقط أو أحياناً في النهار فقط، وهو من الحالات الأكثر انتشاراً في سن الطفولة، شائع عند الذكور أكثر من الإناث ٣:٢

سنة حدوث بول الفراش تختلف باختلاف العمر: ١٥-٢٠% بعمر ٥ سنوات. ٥-١٠% بعمر ١٠ سنوات. ١-٢% بعمر ١٥ سنة. ١٥-٢٠% من مرض البيلة الليلية عندهم بيلة نهارية. ٢٠-٢٥% من مرض بول الفراش يكون ثانوي.

بول الفراش قد يكون :

- بدئياً : عندما يكون العرض موجود دائماً (أي لا توجد فترة جفاف عند الطفل).

- ثانوياً : عندما تكون هناك فترة جفاف عند الطفل على الأقل لمدة ٦ أشهر قبل عودة التبلل مجدداً ويقدر ذلك كما ذكرنا بـ 20-25%.

- من الناحية الجينية (المورثية): بول الفراش هو اضطراب معقد متغاير المنشأ تم وصف موقع المورثات المسؤولة على الصبغيات 12, 13, 22.

الانتشار: هناك قاعدة الـ 15 في بول الفراش:

- 15% من الأطفال بعمر ٥ سنوات عندهم بول الفراش.

- 15% من الأطفال لديهم سلس برازي.

- 15% لديهم أعراض نهارية.

- 15% يشفون تلقائياً كل سنة.

- 15% لديهم فترات أساسية يكونون جافين فيها.

الأسباب: أ- الوراثة: يزداد حدوث سلس البول الليلي عند الأطفال الذين عانى والداهم من هذه الحالة:

- في التوأم وحيدة البضة ٦٨%.

- في التوأم ثنائي البضة ٣٦%.

ب- تأخر النضج في الجهاز العصبي المركزي.

ج- النوم المضطرب: حيث يكون نوم الأطفال المصابين ببول الفراش عميقاً.

ح- انسداد الطريق الهوائي العلوي والشخير أثناء النوم: حيث تبين أنه باستئصال اللوزتين أو استئصال الناميات أو كليهما عند الأطفال ذوي بول الفراش حدث انخفاض بسلس البول الليلي.

خ- الشدات النفسية: - مشاكل الأبوين.

- انفصال الطفل عن الأم (كولادة طفل جديد).

- انخفاض احترام الذات مع سلس بول ليلي.

- بعض حالات اضطراب التمايز الجنسي.

د- إلتانات السبيل البولي: يشكل التبلل العرض الوحيد لإلتانات السبيل البولي عند ١% من الأطفال المصابين بسلس البول الليلي.

ذ- المشروبات التي تحتوي ميتيل الكرانئين يمكن ان تفاقم الحالب بسبب فعله المدر للبول مثل: الشاي، القهوة، الكولا، الشوكولا.

الخلاصة: إن الأسباب الحقيقية لسلس البولي غالباً غير واضحة.

- التقييم: 1- القصة: - كم مرة في الأسبوع؟

- كم مرة في الليلة؟

- كم حجم البول في كل مرة؟

- في أي أوقات من الليل؟

- في أي أوقات من الليل؟

- بدئي أم ثانوي؟

الحدوث عند الأهل	كلاهما	أحدهما	لا أحد منهما
الحدوث عند الأطفال	77%	44%	15%

المساحات المزروعة بالقطن لا تؤثر نهائياً على المساحات السابقة كون موعد زراعتها مختلف كلياً عن مواعيد زراعة المحاصيل الشتوية (القمح، الشعير، المحاصيل العطرية، المحاصيل البقولية) إنما تزرع في فصل الخريف بعد جني المحاصيل الشتوية الأنفة الذكر ووفقاً لمراسلينا فإن زراعة القطن تكاد تكون معدومة في أغلب المناطق ونسبة الزراعة هي وفق التالي:

گري لگی ۱٪، عامودا ۱٪، تربه سپيه ۱٪، الحسكة ۵٪، القامشلي ۱٪، سري كانية ۱۰٪، أما في عفرين و ديرك و كوباني فلا توجد زراعة للقطن .

خامساً - أهم الصعوبات والتحديات التي تواجه أصحاب الأراضي و الفلاحين :

أغلب المزارعين والمهندسين في المناطق الكردية يرون أن هناك صعوبات مشتركة فيما بين المناطق جمعاء ومن أبرزها :

عدم توفر المبيدات والأدوية، وقلة اليد العاملة وذوي الخبرة ناهيك عن موجات الهجرة الضخمة وارتفاع أسعار الأسمدة والبذار والمحروقات كما أن صعوبة التسويق وارتفاع أسعار الشحن تلعب الدور البارز في تكوين الصعوبات كما أن أغلب الآبار التي كانت تعتمد على الديزل أو الكهرباء في الري توقفت عن الخدمة، وثمت صعوبات خاصة بمناطق معينة تخص أوضاعها الأمنية وظروف الحرب ففي مدينة كوباني هناك تخوف لدى المزارعين من وجود ألغام مزروعة بين الأشجار وفي الأراضي وانفجارها بالمزارعين وآلياتهم وسجلت حالات كثيرة تسببت بالحاق الضرر بالمزارعين وبالأراضي، وفي تربي سيبه أفاد مراسلنا استناداً إلى تصريح لأحد المهندسين الزراعيين أن (فأر الحقل) يحتل المرتبة الأولى من حيث التحديات والصعوبات بالإضافة إلى دودة (زابروس) التي تمتص جذور البندورة وتفتك بها.

* المحاصيل الزراعية تشكل مردوداً غذائياً واقتصادياً كبيراً بالنسبة للمنطقة الكردية وعلى الجهات والهيئات المعنية أن تولي الإهتمام الأكبر ليصل المواطن الكردي إلى تحقيق الاكتفاء الذاتي بما يزرعه، وينحصر دور تلك الهيئات بإيجاد حلول للمساحات الزراعية والقضاء على المشاكل التي تواجه هذا العائد المادي والغذائي الضخم في المنطقة.

* الكزبرة و الكمون و حبة البركة :

تعتمد هذه المحاصيل على مياه الأمطار في زراعتها -بعل - ناهيك عن أسعارها المرتفعة، الأمر الذي حث العديد من المزارعين للتوجه لزراعتها وذلك بسبب قلة تكلفة زراعتها مقارنة مع إنتاجها العالي، ففي قامشلو كانت النسبة ۲۵٪، گري لگی ۲۰٪، عامودا ۳۰٪، تربه سپيه ۴۰٪، ديرك ۶۵٪، الحسكة ۱۵٪، و في الدرباسية ۲۵٪، وفي سري كانية حوالي ۱۲٪

و تقدر النسبة المئوية في كافة المناطق بحوالي الـ ۳۲٪ من مساحة الأراضي المزروعة .

* أشجار الزيتون :

تأتي عفرين في المرتبة الأولى وفيها حوالي ۹/ ملايين ونصف المليون شجرة، و تليها في ذلك كوباني، حيث تقدر نسبة زراعة الزيتون بحوالي الـ ۲۰٪ من المساحة الإجمالية، أما بقية المناطق فأشجار الزيتون فيها قليلة.

ثانياً - نسبة الأراضي المزروعة قبل الثورة و بعدها :

لم تتغير مساحة الأراضي المزروعة في كل من گري لگی وعامودا وعفرين وتربه سيبه وديرک والدرباسية، أما في كوباني فهناك بعض المساحات التي تسبب أرقاً للفلاحين خشية من وجود بعض الألغام التي خلفها تنظيم « داعش » بعد هزيمته، ومعظم تلك المساحات تقع في الريف الشرقي لكوباني، وتقدر بنسبة ۱۵٪ تقريباً، أما في الحسكة ليست هناك تغييرات حاصلة في الريف الشمالي، إلا أن الريف الجنوبي شهد تراجعاً للمساحات المزروعة بنسبة ۱۵٪ وذلك بسبب انعدام الاستقرار الأمني والاشتباكات الدائرة هناك.

ثالثاً - هل هناك مساحات من الأراضي الزراعية تخضع لسيطرة المجموعات المسلحة ؟ و هل تزرع أم لا ؟

لا توجد مساحات زراعية تحت سيطرة المجموعات المسلحة في كل من قامشلو والحسكة وديرک وتربه سيبه وعامودا وگري لگی والدرباسية وسري كانية، أما الأمر بالنسبة لمدينة كوباني فهو مختلف تماماً حيث كانت هناك مساحات زراعية خاضعة لسيطرة المجموعات المسلحة إلا أنه تم تحريرها وتزرع من قبل الإدارة الذاتية كما أن مساحات الأراضي الزراعية في عفرين تتميز بعدم وقوعها تحت سيطرة المجموعات المسلحة وخاصة بعد تحرير قرية (مريمين) .

رابعاً - زراعة القطن في المناطق الكردية :

القطن من المحاصيل الصيفية، والمعتمدة على الري في زراعتها، وكانت سري كانية تتصدر المناطق الأخرى في إنتاجها للقطن على مستوى سوريا بسبب توفر الآبار السطحية في المنطقة وكثرة البنايع، كما أن تكلفة إنتاج هذا المحصول كانت منخفضة مقارنة بباقي المناطق علاوة على إنتاجها المرتفع.

الزراعة في المناطق الكردية بعد اندلاع الثورة.. صعوبات وتحديات

* الشعير :

لا يحتاج محصول الشعير إلى كميات كبيرة من الماء لزراعتها مقارنةً مع القمح كونها تملك جذوراً تصل إلى مسافات عميقة في التربة ، وتتركز زراعتها في المناطق شحيحة الأمطار كمناطق الاستقرار الثانية.

ونُسب زراعتها في المناطق الكردية تكون وفق التالي : ففي قامشلو ٢٠٪، وكركي لكي ١١٪، أما عامودا ٢٠٪، تربه سيبه ١٥٪، كوباني ٢٠٪، ديرك ٣٪، الحسكة ٥٠٪، وفي الدرباسية ٢٠٪ أما في سري كانية ١٠٪

و تقدر النسبة المئوية الإجمالية في كافة المناطق بحوالي ١٨٪ من مساحة الأراضي المزروعة .

* العدس وباقي المحاصيل البقولية :

انخفضت نسب زراعة هذه

المحاصيل خلال السنوات الأخيرة على الرغم من أهميتها في الدخول إلى الدورة الزراعية كونها من المحاصيل الهامة التي تغني التربة بعنصر الآزوت وبالتالي إعطاء راحة للأرض في المواسم التي تلي زراعتها وجاءت سري كانية متقدمة في زراعة البقوليات وبشكل خاص «الفاول» بسبب كثرة الآبار السطحية والينابيع وقلة تكاليف الري مقارنة بباقي المناطق ذات الآبار العميقة وهذا يعني سهولة ريهـا _ كما هو الحال بالنسبة للقطن_ ، ويمكننا تقدر النسب المئوية لهذه المحاصيل وفق التالي : في قامشلو بحدود ٥٠٪، كركي لكي ٣٪، عامودا ٦٪، تربه سيبه ٣٪، كوباني ٢٪، ديرك ٤٪، الحسكة ٧٪، الدرباسية ٥٪ سري كانية ٢٠٪.

وتقدر النسبة المئوية في كافة المناطق بحوالي ٥٪ من إجمالي مساحة الأراضي المزروعة.



تضررت الزراعة في المناطق الكردية

المعروفة بخصوبتها بعد اندلاع الثورة السورية، وكانت هناك أسباب كثيرة تقف وراء هذا التضرر، لعل أهمها نقص اليد العاملة وهجرة المزارعين وضعف إمكانيات الحصول على الأدوية والمبيدات اللازمة لسير عملية الزراعة وفق الشكل الصحيح، مجلة ولات ستحاول من خلال هذا التقرير أن تسلط الضوء على أهم المحاصيل الزراعية في المناطق الكردية وأهم الصعوبات التي تواجه المزارعين في المنطقة.

أولاً - أهم المحاصيل الرئيسية في المناطق الكردية :

* القمح :


تشير التقارير الزراعية إلى انخفاض نسب زراعة محصول القمح بعد الثورة بشكل جزئي وخاصة في الزراعات المروية، حيث تعتمد الزراعة المروية على الكهرباء أو الديزل في تشغيل المولدات أو الغطاسات .

تتركز زراعة القمح في مناطق الاستقرار الأولى وعلى وجه الخصوص (خط العشرة) حيث الهطولات المطرية تكون أعلى مقارنةً مع بقية مناطق الاستقرار (الثانية والثالثة والرابعة)، وتقدر نسب زراعة القمح في قامشلو بـ ٥٠٪، كركي لكي بـ ٥٥٪، وفي عامودا ٣٠٪، وفي تربه سيبه ١٥٪، أما في كوباني ٣٠٪، وفي ديرك ٣٥٪، وفي الحسكة ٣٠٪، وفي الدرباسية ٥٠٪ وفي سري كانية ٥٠٪ .

كما أن النسبة المئوية الإجمالية في كافة المناطق تقدر بحوالي ٤٧٪ من مساحة الأراضي المزروعة، إلا أن هذه النسب تختلف فيما إذا كان محصول القمح المزروع (بعل أو مروى)، حيث تؤكد التقارير أن الزراعة البعلية أصبحت بنسب أعلى مقارنةً مع الزراعات المروية .

نسبة المحاصيل الزراعية في المناطق الكردية :

الزيتون ■ الكزبرة و الكمون و حبة البركة ■ العدس وباقي المحاصيل البقولية ■ الشعير ■ القمح ■ الأراضي التي لا تزرع: 0%



اسماء المشاركين في الملف

- شيرين تمو-كوباني
- أيندا كوران-عفرين
- حميد خليل-سري كانيني(رأس العين)
- حسين السينو-الدرباسية
- جان تتر-عامودا
- دلشاد خالد-قامشلو
- جوان تتر-قامشلو
- أحمد شكري-قامشلو
- سالار صالح-الحسكة
- محمد حسن-تربه سبيي (القحطانية)
- محمد زكي محمد-كركي لكي
- عمر أحمد-ديريك(المالكية)

لها المولدة، والمشكلة الأكبر تكمن في عدم وجود قطع غيار وصيانتها والتي تستوجب نقل المولدة الضخمة إلى ورشات الصيانة ناهيك عن المبالغ الباهظة التي كنت أدفعها في كل مرة كانت تتعطل فيها المولدة». لمثل هكذا أسباب وغيرها توقفت الكثير من المولدات الخاصة عن العمل في أغلب المناطق الكردية وبات التفكير في حل أكثر فاعلية أمراً ضرورياً.

شبكة جديدة: في مدينة عامودا تم مؤخراً إنشاء شبكة كهربائية جديدة تقوم على مبدأ وصل التيار الكهربائي مع أسلاك الكهرباء الموجودة سابقاً وفصل شبكة كهرباء النظام من المحولات الضخمة وتوصيلها بمولدات ضخمة لتحويلها إلى أمبيرات وتم توزيع عدد معين منها على البيوت والمحال التجارية ليكون بالإمكان الاستفادة منها وبمبلغ اشتراك بسيط بالإمكان دفعه، يقول المواطن (جومرد حسو) لمجلة ولات: « الشبكة الجديدة جيدة، نتيج لنا ساعات متواصلة من التيار الكهربائي، على الرغم من قدرتها الإعطائية القليلة بالنسبة لشدة التيار الكهربائي حيث نضطر أحياناً إلى فصل بعض المواد المنزلية ذات الضرورة مثل السخانة الكهربائية كي لا يتم فصل التيار بالكامل إلا أنها تبقى أفضل من عملية المولدات التي كثيراً ما كانت تبقى معطلة لأسابيع طويلة وبالتالي حرماننا من الكثير من الأمور ناهيك عن توقف أعمالنا، تبقى الشبكة الكهربائية الجديدة التي تم انجازها حلاً معقولاً.

في كل أوقات الحروب تبرز أزمات شديدة، اقتصادية، أمنية... إلخ... إلا أن تدخل السلطات والهيئات الموجودة لإيجاد حل ولو جزئي يكون هذا التدخل مريحاً بالنسبة للمواطنين وموفراً للحاجيات الضرورية التي تساهم في الحد من الهجرة أو النزوح قدر الإمكان وحسب الوسائل والآليات التي تكون متوفرة لدى تلك الهيئات المختصة التي حملت على عاتقها مهمة إيجاد حلول سريعة واسعافية.

شبكة كهربائية جديدة في عامودا

جان تر

منذ اندلاع الثورة السورية والمحافظات كلها تعاني من أزمة الكهرباء الشديدة والتي بدأت تتزايد مؤخراً وخاصة في فصل الصيف، وكالمعتاد بدأ الشعب يبحث عن طرق أخرى في سبيل الحصول على الكهرباء للقضاء على الحاجات المتعلقة بالتيار الكهربائي، كان الحل الأول متمثلاً في عملية استخدام البطاريات التي تستعمل عادة في تشغيل السيارات والشاحنات الكبيرة وذلك لإضاءة المكان في فترات الليل وتشغيل التلفاز والإضاءة كذلك في المنازل إلا أن العملية لم تنجح وذلك لأن التيار الكهربائي الذي كانت الحكومة السورية تمنحه كان قليلاً من حيث الساعات والتي لم تكن كافية لشحن البطاريات، فكان إن بدأ التجار بإدخال مولدات كهربائية صغيرة إلى المنطقة وبأسعار كانت مرتفعة نوعاً ما بالنسبة إلى العوائل ذات الدخل المحدود، فبرزت مشاكل كثيرة متمحورة حول تأثير مخلفات هذه المولدات على البيئة من ناحية دخانها وضجيجها المستمر وعدم قدرة بعض العوائل على شراء مثل تلك المولدات بهذا الأسعار، فبدأت الإدارة الذاتية بموضوع إدخال مولدات كهربائية ضخمة وتوزيعها على أسواق المدن وأحيائها المختلفة والتي تتيج ساعات متواصلة من التيار الكهربائي وبأسعار معقولة نوعاً ما تُدفع شهرياً من قبل المشتركين بغية القضاء على مشاكل الكهرباء التي باتت في فترة من الفترات سبباً رئيسياً من أسباب هجرة بعض الناس والتجار إلى خارج البلاد، ولكن برزت مشاكل تقنية زادت من حجم المصيبة، يقول المواطن (سعيد حسن) وهو من أحد أصحاب المولدات الكهربائية الخاصة: «توقفت عن إعطاء الكهرباء من مولدتي الخاصة لأسباب عديدة ربما أهمها الأعطال المستمرة التي تتعرض





Avakirin li Tirbespiyê

12

Dema ko mirov seredana bajarekî yan bajarokekî bike, bê guman e ku şeweyên avahiyên wî bajarî û ji çî hatine avakirin, yekemîn tişte ku bala wî dikişîne.

Bजारokê TIRBESPIYÊ jî, weke hemî bajar û bajarokan di destpêka avakirina xwe de, gundekî biçûk bû, ji çend malan pêk dihat mirov dikarîbû wan li ser tiliyên destê xwe bihijmêre, ew mal ji herî û kelpîçan ava dibûn. Hin bi hin ev bajarok di aliyê avakirinê de pêşket, û xelkê bajêr bi "ÇEMENTO" dest bi avakirina xaniyên xwe kirin, hin bi hin şeweyên şaristaniyê derbasî nav avahiyên vî bajarokî bûn, em dikarin bibêjin ku avahiyên nava bajêr ji "ÇEMENTO" hatine avakirin, lê di çend salên dawî de tevgera avakirinê weke hemî tiştan qels û lawaz bûye, û gelek ji avahiyên ku dest bi avakirina wan hatibû kirin ji berî şoreşê ve, îro kar di wan de hatiye rawestandî û nîvrê mane, gelek ji xwediyê wan avahiyan derketine derveyî

welêt.... Eve rewşa avahiyê di bajarokê TIRBESPIYÊ de.

Lê dema ku em berê xwe bidin derdora bajarok bixwe, emê bibînin ku avahiyên wan deveran ji "HERÎ u KELPÎÇAN" hatine û tene avakirin, banê wa xaniyan jî bi "TÛTYAYÊ" tene nuxumandin, em dikarin bibêjin ku welatiyan berê xwe dane vê şeweya ji avakirinê, ji ber buhabûna

"ÇEMENTO û HESIN" û pêdiviyên avakirinê yên dîtir.

Hêjayî gotinê ye ko xelkên TIRBESPIYÊ weke hemî xelkên herêmên dîtir, xaniyên ji "KELPÎÇ" û "HERÎ" yê xweştir ji xaniyên ku ji "ÇEMENTO" hatine avakirin dibînin, ji ber ku bi nerîna wan, xaniyên ku ji "KELPÎÇ û HERIYÊ" hatine avakirin di demsala "ZIVISTANÊ" de germ in, û di "HAVÎNÊ" de hînik û sar in, mirov dikare bibêjê ku gelek ji xwediyê xaniyên ku ji "ÇEMENTO" ne, ji xwe re odeyek yan jî du ode yên kelpîçî avakirine.

Avahî li TIRBESPIYÊ di destpêka avakirina wê de ji tiştên berdest pêk dihatin, lê hin bi hin mirovan berê xwe dane "ÇEMENTO", gelo di rojên bê de, wê rewşa avakirinê li TIRBESPIYÊ çawa be? Bersiva vê pirsê, bê guman ji demê re dimîne ■

مخيم دوميز.. الزواج المبكر.

ليلى محمد

في

الأونة الأخيرة انتشرت ظاهرة الزواج المبكر في مخيم دوميز، حيث الفتيات تتبعدن عن الدراسة في سن مبكرة، وقد تكون عواقب هذه الظاهرة سلبية ومضرة على حياة مستقبل الفتاة والشاب وحتى على الأهل أيضاً، فإما أن تنتهي بالطلاق أو تكون حياة الاثنتين مليئة بالمشاكل و عدم التفاهم إلى آخر العمر، لأنهم قد تزوجوا من دون تفكير وقناعة وعدم تفهمهم لمستقبل حياتهم الزوجية لصغر سنهم وعدم بلوغهم سن الرشد.

فبعض العائلات ترغب بناتها على الزواج في سن مبكرة كي يتفاهروا بين الناس بأنهم زوجوا أولادهم، أجاب السيد علي عن سبب تزويجه ابنته في سن مبكرة و إجبارها على ترك المدرسة في سن الـ 15 لمجلة ولات: ((ماذا ستستفيد من الدراسة والتعليم، فمصير الفتاة الرجوع إلى بيت الزوجية والاعتناء بالأولاد)). وهذا النمط من التفكير هي نتاج التخلف المجتمعي وغير مقتنع بفائدة التعليم له ولا بنته.

كما وتحذرت السيدة زينب لمجلة ولات: بأنها قامت بتزويج ابنتها بسبب الظروف المعيشية الصعبة والفقر الشديد، وأنها غير راضية عن هذا الزواج ولكن ليس في اليد حيلة و أن الظروف كانت أقوى من رغبتها.

وأيضاً روت السيدة ريماء قصة ابنة جيرانها لـ ولات: بأنها كانت من الأوائل في المدرسة و بأنها كانت تحلم أن تصبح طبيبة، ولكن هذا الحلم انتهى عندما قرر أهلها تزويجها، فتقول ريماء بأنني سألتها إذا ما كانت تريد العودة إلى المدرسة، فأجابت: أريد أن أعود اليوم قبل الغد، فأنا أحلم يومياً بالعودة إلى المدرسة ولكن زواجي قريب و أهلي لن يوافقوا، فأنا لست معارضة لزواجي بقدر ما أنا معارضة لصغر سني بالنسبة للزواج الذي لا يؤهلني لأن أكون زوجة و أمّاً، بل أريد أن أكون طالبة على مقاعد الدراسة التي اشتقت إليّ و اشتقت إليها.

إنها لقصة حزينة و مأساوية و توجد مثلها قصص أكثر حزناً و أسى في المخيم، نرجوا من الأهل التفكير بجديّة أكثر في موضوع الزواج المبكر، فالدراسة و

التعليم فائدتها أكثر في الدراسة و التعليم نستطيع أن نبني أجيالاً نافعة للأسرة و المجتمع، و نطالب من المنظمات تكثيف جهودها بإقامة ندوات لتوعية الناس بأضرار الزواج المبكر. ■

إعادة إعمار كوباني

شيرين قو

إلى خارجها، ليتم الاستفادة منها في توسيع الطرقات وإيجاد المساحات الجديدة للإعمار الحكومي داخل المدينة لخدمة المجتمع، كما تم ترميم معظم الطرقات في المدينة والعمل يجري حالياً في القرى.

المشاريع الخدمية التي تم إنجازها خلال هذه الفترة:

ل دعم القطاع التعليمي، تم ترميم وتجهيز سبع مدارس من أصل خمس عشر مدرسة.

بناء مخبزين لتأمين الخبز للأعداد المتزايدة من العائدين.

المراكز الصحية: حيث تم الانتهاء بالتعاون مع هيئة الصحة من المشفى العسكري بالإضافة إلى مشفى الأمل، ومنظمة إيكور الألمانية التي تبني مركزاً صحياً في المقاطعة بالتنسيق مع المنسقية.

بالإضافة لمشروع الحي الجديد، وهو مشروع ضخم بالنسبة لمنسقية إعادة إعمار كوباني، وهو قيد الإنشاء فهو مشروع أساسي للمتضررين الذين تحولت منازلهم إلى متحف حيث أن جميع المخططات جاهزة للمشروع، وتم الانتهاء من أول وحدتين سكنيتين، حيث أن المساحات المخصصة للحي الجديد هي 60 % مساحة خضراء 40 % مساحة معمرة، فالمشروع كمرحلة أولية 1326 وحدة سكنية.

هناك مشاريع يتم التنسيق والتواصل من أجل إقامتها في المقاطعة منها:

إيجاد مقالغ لتوفير البحص والرمل بأنواعه لإعادة الإعمار.

مشاريع لتصنيع حجر البناء (البلك) حجر الطرقات).

المشاريع التي قيد الإنشاء أيضاً، توفير المواد الأساسية للبناء للمواطنين بسعر 30 % مما هو موجود حالياً في الأسواق.

الجدير بالذكر وبحسب منسقية إعادة إعمار كوباني أن المشاريع التي أقيمت في مدينة كوباني قد تم دعمها من المجتمع الكردستاني، حيث تمت حملات لجمع التبرعات في مقاطعتي عفرين والجزيرة والجالية الكردية في الدول الأوروبية لدعم إعادة إعمار كوباني، الأرقام تشير إلى 25 مليون دولار من المبالغ التي جمعها وصرفها على المشاريع في المقاطعة، وأن التحالف الدولي قد خيب آمال الكوبانيين بإعادة إعمار مدينتهم التي دمرت لمحاربة الإرهاب على أراضيها.

ما لم يكن خافياً على أحد أن الحرب التي استمرت على أرض مدينة كوباني بين مقاتلي وحدات حماية الشعب والتنظيم الارهابي (داعش) على مدى ستة أشهر أدى إلى دمار ثلثي المدينة بنسبة 80 % من الابنية والبنية التحتية، فتشكّلت بعد تحرير مدينة كوباني مباشرة منسقية إعادة إعمار كوباني من خلال مؤتمر عُقد في 29 / 1 / 2015 في مدينة ديار بكر (أمد) في شمال كردستان والذي حضره الشخصيات الفكرية وممثلو الأحزاب ومؤسسات المجتمع المدني من أجزاء كردستان الأربعة تم انتخاب خمسة عشر عضواً وهم الآن يديرون منسقية إعادة إعمار كوباني، حيث كان الهدف الرئيسي من هذه المنسقية التي تمخّضت عن المؤتمر إعادة إعمار المدينة كوجه ثانٍ من المقاومة، فلا معنى للمقاومة العسكرية ما لم تكن هناك مقاومة لإعادة الروح إلى المدينة.

شارف عام على تأسيس منسقية إعادة إعمار كوباني، وعدد العائدين فاق منتي ألف عائد إلى المدينة، فكان لا بد من انجازات تليق بمقاومة أبطال مدينة كوباني، فبحسب المكتب الاعلامي والعلاقات الخارجية لمنسقية إعادة إعمار كوباني أنه تم حتى الآن تنفيذ المشاريع الأساسية التالية:

بدأت المنسقية بإعادة ترميم ما يمكن ترميمه في مقاطعة كوباني، حيث تم ترميم 60 - 70 % من شبكة الصرف الصحي و 60 - 70 % من شبكة الكهرباء، فقد تم تمديد الكهرباء عبر المولدات للأحياء، وما زال العمل مستمراً ليتم توصيل الكهرباء لجميع أنحاء المقاطعة.

العمل على إعادة البنية التحتية، حيث تم رفع مليون وستمئة ألف طن من الأنقاض من داخل المدينة



Zarokê me ji zaroktiya xwe bê par bûne

Umer Ehmed



Di jiyana gelan de, û demên şoreş û bûyerên awarte de, gelek tiştên baş û nebaş derbasî nava jiyana merovan dibin, ew bûyerên xerab bandora xwe ya neyînî li ser hemî ast û kesên civakê dikin. Em dikarin bêjin ku yek ji bandora neyînî ya kirîza suriyê li ser zarokan bû, ku dest ji jiyana xwe ya sereke berdan û berên xwe dan alîkî din, aliyê dûrî leystik û zaroketiyê, dûrî xwenidin û zanistê.... ku hejmareke mezin ji zarokan îro di kargeh û firoşghan de kar dikin û tiştek ji zaroktiya xwe ndîtine û jê bê par man e.

Ji bo vê mijarê me gelek hevdiştin bi van zarokan re kir û jiyana wan ya herî zor me gengeşekir, xalid Mihemed ku temenê wî 12 salî ye ji Kovara welat re dibêje: "Ez nikarim bi gogê bilîz im, ew lîstoka ku min gelekî ji hez dikir, niha ez piştî dibistana xwe diçim kargeha eleminyûm û ez kar dikim ta kata 7ê êvarê ji bo ez alîkariyê bi bavê xwe re bikim û ji me pirsî ma ezê çawa bilêz im.

Ebdela Berkel temenê wî 14 salî ye dest ji dibistana xwe berdayiye û berê xwe dayê karê serast kirina tirimbêlan ji Welat redibêje: "Ev saleke ku vî karî dikim û dibistana min nayê bîra min ji ber ku rewşa me nebaşê û ez nikarim di xwendina xwe de berdewam bikim".

Gelo ta kengî wê zarok û kulîlkên paşeroja me dê di vê rewşê de berdewam bikin?

Dibe rojek were ku em zarokên xwe tevî lîstokên wan di yarîgeh, dibiatan û çîmenan hembêz bikin. ■



Vê Zivistanê, Cadeyên Taxa Miftî

Salar Salih

Vê zivistanê cadeyên taxa Miftî kirasekî nû li xwe kirin, îdî tu hew golên avê li van kolanan dibînî piştî baran dibare, herwisa jî pêlavên niştociyên vê taxê hew ji lingên wan dikevin û bi heriyê ve dizeliqin, piştî ku şaredariya gel li Hesekê ya bi ser rêveberiya xweser ve projeya sazkirina cadeyên vê taxê destpêkir, û qonaxek baş ji vê projeyê bikaranî.

Jiber ku cadeyên taxa Miftî, rexê bakur, yê ku bi navê taxa Dahiya Kurdo tê nasîn, bigiştî hîn ax bûn û nehatibûn sazkirin ji bal şaredariya Hesekê ya bi ser Rêjîmê ve, di mehên zivistanî de, dema ku baran dibariya, cadeyên vê taxê hemû dibûn golên avê, û heriya mezeloq lê çê dibû, aştengiyên mezin ji niştociyên vê taxê re çêdibûn, herweha ji turumpêlan re, gellek caran mirov li cadeyên vê taxê çerixîne û ketine nav heriyê û cilên wan tev bûne herî, yan jî pêlavên wan ji lingên wan diketin û bi heriyê ve dizeliqîn.

Lewra şaredariya gel li Hesekê dest bi projeya sazkirina van cadeyan kir, ku destpêkê wê Beqaya deyne dûvre wê aştêkê ji kevirên hûrkirî jî li ser belav bike, û di mehên havîna tê de wê van kolanan qîr bike, ta niha beşekî mezin ji vê projeyê hatiye bicîkirin, û pirê cadeyên vê taxê niha kirasekî nû û tebût ji beqaya li xwe kirine, îdî tu hew golên avê li van cadeyan dibînî, lê tevî ku ev cade hîn qîr nebûne, lê rewşa wan pir baş bûye, û niştociyên vê taxê ji rewşa cadeyan ya nû pir razîne, ku rêjeya heriyê piştî baranan pir kêr bûye, herwisa sebarek turumpêlan ev cade pir xizmetkar in.

Dema me pirs ji endezyarê vê projeyê kir, li ser qonaxên vê projeyê, û li şteya kar û formê dawî yên van kolanan, Endizyar Fêsel yê ku vê projeyê dişopîne, bersiv wisa da me:

Ev proje girêdayî ye şaredariya gel ya Hasakê, destpêkê emê kolanan taxa Dahiya Kurdo û taxa Miftî ya nû bi aştêkê ji over saysê (Beqaya) rûbikin, dûvre jî bi gundorê emê baş ve over saysê bidewsin, piştê aştêke din wê li ser bê danî ji kevirên şikestî angû (kevirê kilsî) wek ku tê naskirin, ew jî bi heman şêweyî dê bê dewsandin.

Kar di vê projeyê de bi rêjeyekê balkêş tê bicîkirin, ta nuha hejmareke mezin ji kolanan van herdu taxan Dahiya û Miftî hatine rûkirin bi over saysê, û bilez rêvebirên vê projeyê dixwazin ku wî bidawî bikin, ta ku welatiyan ji kêşeya heriyê rizgar bikin, ji aliyê dî ve, welatî pir razîne ji sazkirina cadeyên taxa wan, û ew di vê zivistanê de, îdî dikarin bi serbestî bîn û biçin, herwisa jî turumpêlên wan ■



Projeya avkirina nexweşxaneya Can a pisporî li Girkê Legê

Elend Mihemed

Ev bêtirî du mehane projeya avkirina nexweşxaneya Can destpêkiriye û hîmên bingehîn hatine damezrandin, bi ser rîwê zemînê ketiye û ronî dîtiye.

Bê guman e ku tevî rewşa aloz û dijwar a metrsîdar ku Sûriyê tê re derbas dibe, ev proje yek ji pirojeyên geşepêdanê ye ku ji herêma me re pêwîst û giring e.

Xwedî û serperistên wê bijîjk Ehmed Mihemed Emîn Elsilêman û bijîşk Se'îd Mûsa Teter e, barê birêvebirina vê pirojeyê hilgirtine milên xwe, û li ser raman û giringiya vê pirojeyê bijîjk Ehmed Mihemed Emîn Elsilêman ji Kovara Welat re weha axivî: "piştî vekloînekê ji rewşa Girkê Legê ya teduristî re, hate xuya kirin ku ji bilî nexweşxaneya ku heye, herêma hewcedarî nexweşxaneyêke dine, li hêla din hejmara bijîjkan jî li Girkê legê bilind bûye, û hejmara şênîyên herêmê jî pitir bûye tevî koçberên ku ji deverên Sûriyê yên din ku li Cizîrê û bi taybetî li Girkê Legê cîwar bûne, ji lewra herêma hewcedarê vê pirojeyê".

Li ser birêveçûna vê projeyê ji hêla diravî ve, bijîjkan Se'îd Mûsa Teter weha ji Kovara Welat re axivî: "Ev pirojeyêke sîdar û berhemdar e, tevayiya welatî û nişteciyan dikarin di riya pişakan re, pişkdariyê di projeyê de bikin û di paşerojê de mîfayê jê wergerin, nemaze bijîjk û yên di çarçewa teduristiyê de di xebitin".

Drebarî giringiya vê pirojeyê û hemî projeyên geşepêdana ku xizmetguzriya herêmê bikin dermansaz Guhdar Hisên Yûsiv ji kovara Welat re diyar kir: "Ji ber rewşa awarte ya ku herêma



me tê re derbas dibe, kêm bûna pêdiviyên tenduristî, navedên sazkirina dermanan û koçberiya kesên ku pisporin di çarçewa tenduristiyê de, dibînim ku çî proje di hêla sazkirina û avkirina navendên tenduristî, nexweşxaneya Can wek nimûne bîne avkirin dê xizmeta şênîyên herêmê bikin, tevî ku hêviya me ewe ku pirojeyên bazirganî û pîşesazî jî bîne vekirin, da ku bingehêkê ji pêşxistina aborî û geşepêdana herêmê re were damezrandin".

Derbarî sîdeya projeyên avakirinê li ser jiyana welatî û şênîyên herêmê Yasir Mirad yek ji hostayên ku di avakirina nexweşxaneyê dixebite ji Welat re axivî: " derftên kar li pêşiya me vedikin, Bi dehan malbat sîde û mîfayê ji van projeyan werdigirin, çendî projeyên geşepêdanê di herêmê bîne vekirin, wisa jî mirov bi xaka welêt ve tê girêdan û hêviyan bi paşerojêke geş xurtir dike".

Bê gumane ku divê rewşa aloz û dijwar de, tevî buhabûna pêdiviyên avakirinê û pêla koçberiyê, hîn mejiyê avakirin û geşpêdana herêm û civakê dirame û sax e. ■



Dewara Zorê

Dilşad Xalid

Şoreşa Sûriyê ya ku ta niha bi sedê hezaran şehîd bûn, bi milyonan koçber bûne ji bo ku armacên wê pêk bînin, lê diyare ku çî şoreşa heyî bêyî kar û kiryarên xirab dê bi dawî nebe. Li hemû bajar û bajarokên Sûriyê piştî ewlehî kêm bû, rê li ber gelek tiştên xirab û nebaş vebû, yek ji wan tiştê em li ser daxivin şeweyê dan û standina ku ji aliyê polîs û asayîşa rêjîma Sûriyê bi millet re tê bikaranîn, ne xasim li ser rêbendan.

Welatiyên Sûriyê dema ku di rêbendên asayîşa rêjîmê de derbas dibin ew neçar in bi sedem û gelek caran jî bê sedem ku baca derbasbûna xwe bidin.

Li bajarê qamişlo jî welatî ji vê yekê nehatine paraştin, dema mirov ji bajarê Heseke ber bi Qamişloyê ve tê, di feteloka Zorê angû (Dewara Zorê) re derbasa dibe, ya ku ta niha di bin destê rêjîma Sûriyê de ye, û li wê fetelokê çî otûmbîl derbas dibe polîs wê radiwestînin û bi çî bihaneyê be pereyan ji ajovanê wê destîne, yan jî ji siwarbûyên otûmbîlê destîne, ev yek ji welatiyan re bûye kêşeyeke mezin, nexasim xwendevan ji ber ku gelek ji wan ji bo leşkeriya bi zorê ya rêjîmê tî xwestin, li ser vê mijarê Mihemed Bekir ji Kovara Welat re axivî:

” ez xwendevanekî zanîngehê me, berê ez di

rêya Dewara Zorê re diçûm û dihatim, lê carekê û bi bihaneya leşkeriyê polîsan ez çend demjimêran rawestandim ta ku bavê min hat û 75 hezar da wan û bi rastî ew yek ji bo me giran bû ji ber ku rewşa me ya abûrî ne gelekî başe”.

Ji ber ku ev yek gelek caran û bi gelek kesan re çêbûye xelkê rêyek din ji xwe re dîtî û ew jî ku berê xwe bidin Amûdê û ji Amûdê ber bi Heseke ve herin, lê dirêjbûna rê û kirya giran ew jî pirsgerêkeke.

Li ser vê pirsgerêkê Kawa Husên weha ji Welat re axivî: “Ez niha diçim Amûdê û ji wir diçim Heseke karê xwe diqedînim, lê rê gelekî dirêj bûye û her wiha ez 100 lêreyên Sûrî zêde didim û ji ber ku karê min her roj heye ez gelek gazinan ji ber wilo dikim, lê çiqasî gazinên min hebin ez dikarim bi azadî herim û bêm bêyî ku ti kes gotinên nexweş bo min bêje û bi ser de jî pereyan ji min bistîne”. Ji aliyê xwe jî Ehmed ku ew jî ajovanê serbîsekê ye weha ji Kovarê re dibêje: “ Em hêvî dikin ku rêveberiya xweser rêyeke kurt jib o xelkê çê bike û em ê jî ji aliyê xwe pereyên kêm ji wan bistînin ji ber ku erkê me ye ku em bi hev re û bi milletê xwe re alîkar bin”.

Diyare ku tevî ku rewşa bajarên kurdî ji aliyê ewlehî ji piraniya bajarên Sûriyê cuda ye û bi bajarên aram tîne naskirin, lê hîn pirsgerêkin din hene mîna Dewara Zorê ku welatiyên bajarên kurdî gazinên mezin ji ber wan dikin û ji bo wan çareserkirina van pirsgerêkan giringtîre ji gelek tiştê din di jiyane de ■



Hisên Alsîno

PEYVA WENDAYÎ

HEWLÊR – AMED –
MEHABAD – QAMIŞLO
– DIRBÊSIYÊ – EFRÎN
– DUHOK – QENDÎL
– ZAB – ZAXO –
BADÎNON – BOTAN
– RUHA

Ê	Y	I	S	Ê	B	R	I	D
N	A	Q	E	N	D	Î	L	I
A	N	Q	A	M	I	Ş	L	O
T	D	K	Z	N	R	B	A	Z
O	R	A	Î	Ê	A	M	E	D
B	X	R	L	K	O	H	U	D
O	F	W	S	R	U	H	A	U
E	E	B	A	D	Î	N	A	N
H	D	A	B	A	H	E	M	T

Peyva wendayî ji 9 tîpa pêktê,: welatê bê Dewlet ku ev bajaraba jê çêbûne

--	--	--	--	--	--	--	--	--

XAÇERÊZ

Raşt :

- 1-sitrake hunermend şivan perwer
- 2- tîpek kurdî (vajî) – tîpên yekem ji (RASTG çep) bi inglîzî
- 3- komareke asiyewî
- 4- bajarekî feleştînî (vajî) – wekhev cînavek kurdî
- 5- heyvek Zayînî – di jî bejî (vajî)
- 6- bê Aqil – navekî keçan (vajî)
- 7- tama xwê
- 8- du tîp ji (mele) – kêf – Alavek ji bo xwestinê
- 9- Navê serokekî partiyeke kurdî rojava di 2010 an de çû koçadawî

Serjêr

- 1-KAR – Alavek ji bo rawes tandinê (vajî).
- 2- yak u pûş Dike ka (vajî) – Simbola dewletê (vajî).
- 3- Mezin bi Erebi.
- 4- çend tîp ji (zindan) – ji bo bersivê (vajî) – du tîp ji şêr
- 5- ne mirî – Dijî Raşt
- 6- êzgehek li Rojava – çend tîp ji radiyo
- 7- mal (ji hev bela) – çend tîp ji narîn
- 8- kurê kur – alavek ji bo xwestinê
- 9- ji bo bersivê – kesê zengîn

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2									
3									
4									
5									
6									
7									
8									
9									

Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .

	2				5	1	8
		1			2	7	3
3	6				8		4
7		6		5	4		
	8		2		7		3
			8	1		7	9
6			4			5	1
4	1		7			9	
5	9	3					4

Ferhengok

- إهمال، لامبالاة، تسبیب Xemsarî
التزام Pabend, pêgir
إرهاب Tundrewî, têror
إحياء Vejandin
شكل، أسلوب، شكل Teher, şêwe
إسناد، دعم Palpiştî, piştgirî
أدب Wêje, tore
آسر القلوب Dilrevîn
احتجاج Girev
إمكانية Gengazî

PEND Û ŞÎRETÊN KURDÎ

- Gula hevalan têşênê.
- Mala mêra kaniya zêra.
- Ne gundê bê rez,ne şivanê bê pez,ne kesê bêjê ez û ez.
- Ne ker û ne hîz dirî.
- Tu kes na bête dewê min tirş e.

pêdariya li ser xaka welêt rûmet e



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٢٦) ٢٠١٦/٣/١